Ji bo rastiyan veşêrîn çapemeniyê hedef girtin

20 weşan hatin girtin

Piştî civîna MGK'ê 20 saziyên ku bi kurdî weşanê dikin, xitabî elewiyan û zarokan dikin bi awayekî derqanûnî hatin girtin. Gelek derdorên cuda bertek nîşanî astengikirina weşanan dan

Îktîdara AKP'ê, piştî hewldana darbeya leşkerî ya 15'ê Tîrmehê de li ser daxwaza Serokomar Erdogan, di 21'ê tîrmehê de OHAL hat îlankirin û bi îlana OHAL'ê û biryarên KHK'e re dijberî sazî, dezgeh û rêxistinên demokratîk êrîş li ser êrîşan pêk hatin. Herî zede saziyen çapemeniye para xwe ji van êrîşên hikûmetê girt.















Di çarçoveya OHAL'ê de bi dehan rojname, tv, radyo hatin girtin. Heri dawî Lijneya Ewlehiya Neteweyî piştî kom bûn û piştî civînê der barê 20 televîzyonên ku piraniya wan kurdî weşanê dikin biryara girtinê hat dayîn. Di çarçoveya xala 668'an KHK'ê yên OHAL'ê de darbe pêk hat. Di nav de Azadi, Jiyan, Denge TV, Hayatın Sesi, Van TV û radyoyen wekî Yon Radyo, Mersin SES, Radyo Dunya bi giştî 20 radyo û Tv hatin girtin.

Li gorî endamê Desteya Bilind a Televîzyon û Radyoyê (RTUK) Îlhan Yerlîkaya, biryara girtina kanalên televîzyonê di çarçoveya biryarnameya xwedî hukmê qanûnî de hatiye dayîn. Kanalên televîzyonê yên hatine girtin, dê di rojên pêş de bibin mijara rojeva RTUK'ê.

'EV DARBE YE'

Têkildarî girtina televîzyonan Endame RTUK'ê Ersin Ongel diyar kir ku biryara girtina televîzyonan a şev nîvê şevê darbe ye û wiha got: "Ev weşanên ku hatin girtin dem dem ji ber naveroka weşanê rasti ceza hatin. Lê piştî biryarên KHK'ê û OHAL'e RTUK'ê der barê wan de biryara girtinê da. Girtina van radyo û televizyonan darbeya li dijî azadiya çapemeniyê ye. Balkêş e hemû qanal û radyoyên hatin girtin hemû yên kurdî û umxalif in. Ev biryarek li dijî denge herêmî û kurdî ye." ***ENQERE - ANF***

Êrîşî baweriya elewiyan kirin

GELÊ DERSIMÊ bertek nîşani girtina qanalen TV10 û Jiyane dan û diyar kirin ku qanalên hatin girtin qutkirina dengê û qedexeya baweriya gelan e. Dêrsimiyan destnişan kirin ku girtina televîzyonan nîşaneya êrîşen din ên li dijî deng û baweriyan e. Federasyona Elewiyan a Demokratîk li Ewropayê (FEDA) li ser girtina 10 kanalên televîzyonê daxuyaniyek da. Di daxuyaniyê de hat ragihandin ku TV 10 ku dengê elewiyan e, yek ji kanalên hatine girtin e banga xwedîderketinê li TV 10'ê kir. ***AMED***

Radyo Ses: Ji rastiyan ditirsin

POLÎSÊN AKP'Ê deriyê Radyo Ses a li Mêrsînê girt, deriyê wê jî mohrkirin. Xebatkara Radyo Sesê Fatma Olmez bi lêv kir ku bi şev piştî ku deriyê radyoyê hatiye şikandin weşan hatiye rawestandin û sedema girtina radyoyê nizanin. Olmez destnîşan kir ku ew ê mafê xwe biparêzin û dê dengê xwe bigehînin gel. Parêzerê radyoyê Alî Bozan jî anî ziman ku KHK bi awayeke kêfî tên bikaranîn û ev tişt anî ziman: "Ji bo ku radyo careke din dest bi weşanê bike çi ji destê wan bê dê bikin." ***MÊRSÎN - DÎHA***

Dunya: Dê têkoşîn bidome

PIŞTÎ BIRYARA RTUK'ê ya girtina 10 televîzyonan, deriyê Radyo Ses a li Mêrsînê jî hatibû morkirin. Piştî vê yekê li Edeneyê jî polîsan bi ser Radyo Dunya de girtin. Polîsên ku li avahiya radyoyê ya li navçeya Seyhanê lêgerînê kirin, hat hînbûn ku dê weşana radyoyê qut bikin. Gerînendeya Weşana Giştî ya Radyo Dunya Gumuş, bertek nîşanî biryara girtina radyoyê da û diyar kir ku ew dê bi sekna Gurbetelli Ersoz û biryara Apê Musa têkoşîna xwe berdewam bikin. ***EDENE***

KCD çû serdana televîzyonan

Heyeta ji Hevserokê Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) Hatîp Dîcle, endamên Dîwana Serokatiyê Hasan Yagiz, Musa Farogullari û Serhat Bingol pêk dihat çûn serdana televîzyonên Azadî TV, Hayatin Sesî TV, Jiyan TV, Wan TV û Zarok TV yên bi pêkanîna OHAL û KHK'ê hatin girtin û heyetê piştgiriya xwe ji TV'iyan re aşkere kir.

Di serdana Wan TV de Hatîp Dîcle feraseta AKP'ê ya li hember girtina televîzyonan wekî darbeyê nirxand û wiha got: "Bi taybetî ev êrîş li dijî kurd û weşangeriya kurdî ye. Em êrîşên li dijî kurdî re rûbirû mane. Em vê pêkanîna reşkirina weşana şermezar dikin û piştgiriya xwe didin xuyakirin. Bi îlankirina OHAL'ê re ev dem ji dema darbeya 12'ê Îlonê bihuriye. Ev êrîşên faşîst serdema Hîtleran a faşîst tîne bîra mirov." ***AMED***



Dolar 3 TL jî derbas kir

Li Tirkiyeyê her ku diçe rewşa aborî xirab dibe û gotinên rayedarên dewletê li hev nakin. Piştî ku Moody's pîleya kredî ya Tirkiyeyê daxist asta 'sergo' dolar zêdetir dibe û ji niha ve 3 TL'ê jî derbas kir. Serokomarê tirk Erdogan rewşa aborî mîna lîstikên hêzên derve dinirxîne, zavayê wî û wezîrê Enerjiyê Berat Albayrak henekên xwe biryara Moody'sê kir. Lê Cîgirê Serokwezîr Mehmet Şîmşek da zanîn ku biryara Moody'sê cidî digirin û hewl didin pîleya krediyê bilind bikin. Wisa xuya dike di rojên pêş de dê aboriya Tirkiyeyê pir xirab bibe. ***AMED***

'Ji bo OHAL'ê 12 meh jî têrê nake'

Serokomarê tirk Recep Tayyîp Erdogan cara 27'emîn bi keyayan re civîn lidarxist. Erdogan di axaftina xwe de balkişand ser dirêjkirina dema Rewşa Awarte (OHAL) û wiha got: "Em niha bi demê re ketine pêşbirkê. Wisa xuya dike ku 3 meh têrê nake. Ji ber vê yekê di civîna Lijneya Ewlehiyê ya Neteweyî (MGK) de hat pêşniyarkirin ku OHAL 3 mehên din jî were dirêjkirin. Hikûmeta me jî çi pêwîst e dê bike." Erdogan mînaka dirêjkirina OHAL'ê ya Fransayê da û wiha got: "Fransayê biryara salekî ya OHAL'ê girt. Li cîhanê tu kesekî ji Fransayê re negot we çima biryara salek OHAL'ê girt. Hinek hevalên me yên wezîr dibêjin bila êdî bi dawî bibe. Ez jî ji wan re dibêjim rawestin, tiştekî wisa nabe, sebir bikin, 12 meh jî têrê nake." ***ENQERE***

DBP û HDP'ê nerazîbûn nîşan da

PARTIYA HERÊMAN a Demokratîk (DBP) û Partiya Demokratîk a Gelan (HDP), bi daxuyaniyên nivîskî girtina kanalan şermezar kirin.

Di daxuyaniya DBP'ê de hat ragihandin ku girtina TV û Radyoyan darbeya li dijî çapemeniya azad e û hat gotin ku Zarok TV yekane kanala bi kurdî ji bo zarokan weşanê dike û Jiyan TV jî yekane kanala televîzyonê ya bi zaravayê Dimilkî weşan dikir, bûn. DBP'ê da zanîn ku TV 10 jî li ser çand, kevneşopî û jiyana civaka elewiyan weşana xwe dikir. HDP'ê jî girtina 10 TV û radyo şermezar kir û da zanîn ku di roja dirêjkirina OHAL'ê de darbe ye û hat destnîşankirin ku ev pêkanînên li dijî çapemeniyê cihê xwe di hiqûqa navxweyî û navneteweyî de nîne. ***ENQERE - ANF***



Şîrove
Ahmet Aktaş
saktas25@hotmail.com

Tirkiye çima ewqas ket rojeva cîhanê?

Di vê dema dawî de, trafîka dîplomasiyê li Tirkiyeyê gelek zêde bû. Gelo çima?

Di dema darbeyê de, AKP gazinc ji dewletên cîhanê hemûyan dikir û aşkera digot, "ji nav dewletên cîhanê, yek tenê jî ji rêveberekî wan, ji bo serxweşiyê nehat serdana me!" Lê niha em bala xwe didinê, di serî de Amerîka û pişt re dewletên din, wekî ku ketibin rezê û wekî bi hev re ketibin nava pêşbirkê, giregirên wan, yek diçe yek tê.

Ji Amerîka, bi cîgirê Obama John Bîden re serdana Tirkiyeyê dest pê kir, pişt re Serokê Artêşê û hwd. da pey hev. Ji Inglistanê Wezîrê Karûbarê Derve Johnson, ji YE Serokê Parlamena Ewropayê, nûnerên bilind wekî Luîsa Mogherînî hatin Tirkiyeyê.

Her wiha Sekreterê Giştî yê NATO Stoltenberg jî hat Tirkiyeyê. Trafîka Merkel a Tirkiyeyê jî xurtbû, lê vê dema dawî navbera wan hinekî sar xuya dike. Navbera wan û Hollanda jî xerabûye. Li gorî saloxan Wezîrê Karûbarê Derve yê Danîmarka, Prensê Siûdî Weliaht Abdulezîz tê Tirkiyeyê.

Wezîrê Karûbarê Derve yê Îranê Cewad Zarîfî jî bû çend care ku tê Tirkiyeyê. Serokê Arteşa Rûsyayê hatibû Tirkiyeyê û niha jî tê gotin ku di 10-11'ê cotmehê de Pûtîn jî tê Tirkiyeyê.

***

Ma gelo van berpirsiyarên giregir yên van dewletan, ji bo xêra Tirkiyeyê tên? Na xêr. Hemû ji bo berjewendiyên xwe tên û diçin. Sedemên ku niha ewqas zêdê tên jî, ne ji ber ku dewleta tirka pir hêja ye an jî pir mezin e û bi îstîkrar e. Na xêr, berovajî, bi taybetî jî piştî "Darbeya Feto", ger qudretek vê dewletê hebû ya jî, ew jî hilweşiya û tiştek tê de nemaye.

Mirov dikarê bişibîne dema "mirovê nexweş" yê Împaretoriya Osmaniyan. Wekî wê çaxê, dîsa hemû dewlet û bi giranî jî dewletên gir, wekî Amerîka û Rûsya, ji bo parçeyekî ji vî laşî bixin para xwe, têne serdana dewleta nexweş ya AKP'ê dikin. Yanî bi gotinek din, mirov dikare bibêje niha ji laşê Beşar Esad û Hesen Ruhanî bêhtir van dewletan li ser Tirkiyeyê ketine nava pêşbirkê. Ji ber ku AKP jî rehet na sekine, muziriya dike.

Bêguman ji bo xwe ji devê van guran rizgar bike dewleta AKP'ê jî, ne li dijî wan, belê li dijî gelê me yê mazlûm, hinek projeyên bê xêr daye ber xwe û bêwijdanî û bêexlaqî hespê xwe ji bo vê armancê dibezîne. Helbet nikare xwe rizgar bike û pir xerab jî têk diçe. Ji Amerîka ra dibêje; "dev ji tevgera kurdan berde, were ez û tu bi tenê em dikarin Reqa û Musilê jî rizgar bikin!" Wekî ku Amerîka herêmê nas nake, hêzên li wir nas nake û nizane ku kî dikare çi bike, bi tenê AKP'î zanin û lewma aqil dide wan!

Bêguman li herêmê, ji bilî Tevgera Azadiya Kurdan (di serî de PKK, PYD û hwd.) yê xwedî biryar in. Yên ku dibêjin filan hêz (wekî PDK, ENKS, DAIŞ, El Nûsra û hwd.) û filan dewlet (Tirkiye, Îran, Suriye, Îraq û hwd.) razî nabin an jî qaîl nabin, şaş analîzan dikin. Ev hemû; hinek jê bi Rûsya ve, hinek jî bi Amerîka ve girêdayî ne. Rûsya û Amerîka jî heta niha hinek bilevhatinê dikaribûn bi hevre bimeşiyan, lê diyar e ku nakokiyên navbera wan jî dijwar dibin. Ev babet dirêje û mijara nivîsek din e.